An Oifig um Chosaint
Idirnáisiúnta
International Protection
Office

KODA TEVGERIYANÊ YA DAXWAZKER
ZANYARIYÊN TÊKILDARÎ TE
HEVPEYÎVÎNA SERHÊL A PARASTINA NAVNETEWEYÎ

Te ji bo parastina navneteweyî li vê parêzgehê daxwaz daye û zanyariyên têkildarî daxwaza xwe li pirsnameya xwe bo vê rêveberiyê raber kiriye. Armanca Hevpeyvîna Serhêl a Parastina Navneteweyî vekolandina tevav a daxwaza te ji zanyariyên raberkirî û wan zanyariyan e ku tu yê di hevpeyîvîna xwe ya sserhêl de raber bikî. Ji bo vî karî pêwîstî bi pirsîna deqqîq têkildarî mijarên pêşkêşkirî ji aliyê te ve li pirsnameyê û babetên din e ku hevpeyîvîner pêwendîdar bizane. Tu divê li ser her pirsekê ku ji te tê kirin û tê nagihêjî, ji hevpeyîvîner daxwaza ronkirin û şiroveyê bikî.

Tu divê tirs û nîgeraniyên xwe bi awayekî zelal û deqîq şirove bikî û hemî zanyarî û hûrgiliyên têkildarî şert û mercên xwe yên taybet raber bikî. Hevpeyîvîn derfetek e bo te da ku bi hûrî şirove bikî ku çima ji vegeriyana bo welatê xwe yê jêderk ditirsî.

Eva **erka te ye ku bi tevavî hevkarî bikî û tevav rastbêj bî.** Raboriyên nivîskî yên hevpeyîvîna serhêl ji aliyê hevpeyîvînerê têkildar û aliyên potensiyeldar ên têkildarî daxwaza te tên hilgirtin. Raboriya hevpeyîvînê ji te re tê xwendin û di heyama hevpeyîvîna serhêl de mora dem û rojê tê lêdan û ev derfet li ber destê te heye da ku hûrgiliyên ku difikirî bi tamî nehatine belgekirin, serrast bikî. Ji te tê xwestin ku bi awayê devkî (nenivîskî) piştrast bikî ku raboriyên hevpeyîvînê di heyama hevpeyîvîna xwe qebûl bikî û ev dem di dosyeyê de tê tomarkirin. Mora demê piştrastkirina devkî û dem û roja wê piştrast dike.

Rêveberiya Parastina Navneteweyî di bin ti şert û mercekê de dê digel rayedarên welatê ku tu jê direvî, di têkiliyê de nebe.

Piştî hevpeyîvînê şîret û tewsiyeyek têkildarî daxwaza te tê raberkirin û eger ew şîret nerênî be, te yê ev derfet hebe ku li Dadgeha Pêdaçûnê (Venihêrandin) ya Parastina Navneteweyî gilî bikî.

Rola wergêrê devkî: Wergêrê devkî (ne-nivîskî) heke beşdar be, pirsên hevpeyîvîner û bersivên te bi baldarî şirove dike. Wergêr ne rawêjkariyê dide te û ne jî nêrîna xwe li ser pênase û çawanîya dosyeya te tîne ziman. Haya wergêr ji nihênîbûna hevpeyîvînê heye, wergêr nikare ji bilî bi rêya hevpeyîvîner bi te re biaxive.

Nûnerê Qanûnî: Nûnerê Qanûnî yê te, heke beşdar be, dikare hin notan binivîse, lê nabe ku ew gotina te bibirre yan bersiva pirsekê bide. Di dawiya hevpeyîvînê de, ji Nûnerê Qanûnî yê te dê were pirsîn ku gelo nêrîneke xwe ji bo raderbirrînê heye yan na.

Di destpêka hevpeyîvînê de ji te tê xwestin ku piştrast bikî ku te ev belgename xwendiye û tê gihîştîyî.

Navê daxwazker:

Roja lihevkirinê: RR/MM/SSSS **Roja lihevkirinê: RR/MM/SSSS**